Piştî ku pêvajoya hevdîtinan a ku di 21'ê Adar'a 2013'an de dest pê kiribû di Tîrmeh'a 2015'an de bi dawî bû, bi hinceta ku li Sûrê di 14'ê Gelawêj'a 2015'an de Xweserî hatiye ragihandin, ji aliyê Parêzgeriya Amedê ve di 6 û 7'ê Rezber'ê, 13 û 14'ê Rezber'ê û di navbera 10 û 13'ê Kewçêr'ê de qedexeya derketina derve hat ragihandin. Paşê jî bi navberan di navbera 28 û 30'ê Sermawez'ê û herî dawiyê jî di navbera 2'yê Berfanbar'ê (di 10'ê Berfanbar'ê de rojek navber hat dayîn) de qedexeya derketina derve hat ragihandin. Qedexeya ku di 11'ê Berfanbar'ê de hatibû ragihandin, îro hê jî didome. Ligel ku di meha Adar'ê de hat ragihandin ku operasyon bi dawî bûne jî, li taxên ku qedexe hatibû ragihandin hê jî ji derveyî makîneyên kar û mutehîtan nahêlin ku kes têkeve wan taxan. Li gor daneyên gelheyê yên 2015'an gelheya taxên Cevat Paşa, Fatîh Paşa, Dabanoglû, Hasirli, Cemal Yilmaz û Savaş'ê, bi giştî 22.323 ye. Piştî ku qedexe hat ragihandin nêzê tevahiya vê gelheyê ji cih û warê wê hat koçberkirin. Piştî qedexeya duyemîn a ku di 13'ê Kewçêr'ê de hatibû ragihandin, Lijneya Koordînasyona Bajêr a TMMOB'a Amedê li van taxan xebata lêkolînê da destpêkirin. Di van lêkolînan de zirar û ziyanên 706 kargeh û malan hatin destnîşankirin û hat diyarkirin ku ji van avahiyan 693'yên wan dikarin bên nûkirin lê 13'ên wan diviyabû ku bi awayekî hûrgilî bihatina vekolandin. Di vê pêvajoyê de tê dîtin ku hîna pevçûn gur nebûne û çekên giran nayên bikaranîn. Vê pêvajoyê heta destpêka qedexeya dawîn a ku di 2'yê Berfanbar'ê de dest pê kir jî dewam kir. Bi qedexeya ku di 2'yê Berfanbar'ê de hat ragihandin re nava Sûrê bû qada şerekî hilweşîner a ku hêzên ewlehiyê tevahiya çekên giran lê bi kar anîn. Di vê pêvajoyê de ji derveyî nûçeyên Ajansa Anadoluyê û hinek hesabên medyaya civakî yên Tîmên Taybet ku hinek dîmen parvedikirin, der barê van taxên qedexekirî de tu agahî nehatine bidestxistin. Bi qasî ku me ji van dîmenan tesbît kir, hinek avahiyên dîrokî yên wek Mizgefta Qûrşûnlû, Mizgefta Hecî Hemîd, Hemama Paşa, Mala Mehmed Ûzûn, Dêra Ermenên Katolîk û Minareya Çarling zirareke mezin dîtibûn. Mixabin ligel hemû daxuyanî, bertek, daxwaznameyên nivîskî, dozên ku hatin vekirin jî wek TMMOB'a Amedê, me nikaribû ku em têkevin qadê. Û me nikaribû em pêşiyê li zêdebûna zirar û ziyanan bigirin. Piştî ku hêzên asayîşê wek rêbazeke leşkerî bi taybet li taxa Hasirliyê dest bi hilweşandina avahiyan kir û bi wesayîtên zirxpoş ên giran hewl dan ku bikevin taxê, êdî pêvajoya jiholêrakirina 6 taxên qedexekirî yên nav Sûrê dest pê kir.


Sûr







Sûr


Kurşunlu Camii



Sûr

Operasyona leşkerî ya ku li Sûrê dihat meşandin, bi daxuyaniya fermî ya Wezareta Karên Navxweyî di 9'ê Adar'a 2016'an de bi dawî bû. Di operasyona ku bi tevahî 103 rojan domiyabû de li nav Sûrê hilweşîneke pir giran pêk hatibû. Lê ligel vê yekê jî, bi xebateke berfireh ev tax û avahî dikaribûn rizgar bikin. Lê piştî ku operasyon bi dawî bûn, di mêjûya 21.03.2016'an de bi biryara Lijneya Wezîran a bi hejmara 2016/8659'an û li gor xala 27'emîn a zagona giştîkirinê ya bi hejmara 2942'yan, li nav Sûrê ji 7714 parsêlan ji bo 6292'yan biryara Giştîkirina Lezgîn hat ragihandin. Parsêlên mayî jî ji ber ku berê di çarçoveya veguherandina bajêr de hatibûn giştîkirin di vê biryarê de cih negirtibûn. Ji bo biryara gitştîkirina lezgîn jî biryara 'Qada Xeternak' a ku di 2012'an de hatibû wergirtin wek çavkanî hat nîşandan. Lê ev rewş bixwe jî li dijî Zagona Giştîkirinê ye.



**Rewşa Parselasyonê ya ku bi biryara Giştîkirina Lezgîn a Lijneya Wezîran a mêjûya 21.03.2016'an û bi hejmara 2016/8659'ê derketiye holê.**

**Qadên ku bi vê biryarê hatine giştîkirin.** (sor)

**Qadên ku berê hatine giştîkirin.** (şîn)

Ji bo ku wesayîtên zirxpoş tê de derbas bibin, hilweşandinê di dawiya meha Reşemi'yê de dest pê kir, û bi vê biryarê li tevahiya qadê pêk hat. Bi qasî ku me dikaribû bişopînin, ev hilweşandin bê plan didomiya. Her çiqas ev hilweşandin di fermiyetê de bi destê Wezareta Bajarvanî û Hawirdorê pêk hatibe jî tê zanîn ku saziya rayedar Gerînendehiya Asayîşê ya Bajarê Amedê bûye.


T.C.
SUR KAYMAKAMLIĞI
İlçe Emniyet Müdürlüğü

DAĞITIM YERLERİNE

Dr. Mustafa TUR[illegible]
Kaymakam

DAĞITIM:


T.C.
DİYARBAKIR VALİLİĞİ
İl Kültür ve Turizm Müdürlüğü

Konu: İzin Talebi

DİYARBAKIR MİMARLAR ODASINA

Bilgilerinizi ve gereğini rica ederim.


Taner BİRCAN
Vali a.
Vali Yardımcısı

## PLANA AVADANIYÊ YA JI BO PARASTINÊ

Dema ku hilweşandin didomiya, di Berfanbar'a 2016'an de Wezareta Bajarvanî û Hawirdorê plana avadaniyê ya parastina nav Sûrê ya ku di 2012'an de hatibû amadekirin guherand. Gava ku mirov li guherînên ku di planê de hatine kirin dinihêre, dibîne ku hinceta bingehîn a xalan 'ewlehî' ye. Di plana nûkirî de tê dîtin ku li nav Sûrê avakirina şeş qereqolan, firehkirina rêyan û veguherînên wekî din hene. Wek mînak; kuçeya YenikapÎ (Kuçeya Minareya Çarling) a ku Tahîr ELÇÎ lê hat kuştin, di plana guhertî de wek kolana Yenîkapiyê derbas dibe. Armanca firehkirina kuçeyan vekirina rêyên ku dê qereqolan bi hev ve girê bide ye û ev yek dike ku raçînka kuçeyên nav Sûrê ya ku wek qada parastî hatiye destnîşankirin xera dike. Bi taybetî li taxa Elî Paşayê beşên bi hejmara 276 û 277'an di planên îmarê yên parastinê de bi tevahî wek qadên malan dixuyê, li vê qadê 3 jê wek çandî/dîrokî destnîşankirî, 21 avahî hene.


2012 Plana Avadaniyê yên Parastinê

Di veguherîna planê de taybetiyên heyî yên vê qadê li ber çavan nehatine girtin û wek "Qada Saziyên Fermî (Qada Xizmetên Asayîşê)" hatine nîşandan.




• Tevahiya beşa bi hejmara 276 û 277'an a li taxa Elî Paşa'yê li gor KAÎP'a (Planên Avadaniyê yên Parastinê) heyî wek Qada Malan,
• Tevahiya beşa bi hejmara 647'an a li taxa Fatih Paşa'yê li gor KAÎP'a (Planên Avadaniyê yên Parastinê) heyî wek Qada Malan,
• Li taxa Îskender Paşa'yê parsêlên bi hejmarên 24, 28, 31, 32, 33, 36, 37, 38, 39,41, 70, 71,74, 75, 89, 106, 107, 109'an ên beşa bi hejmara 136'an û li gor KAÎP'a(Planên Avadaniyê yên Parastinê) heyî wek Qada Malan Û Park,
• Li taxa Mêrgahmedê parsêla bi hejmara 57'an a beşa bi hejmara 322'yan û li gor KAÎP'a(Planên Avadaniyê yên Parastinê) heyî wek Qada Dezgehên Civakî,
• Li taxa Fatih Paşayê parsêla bi hejmara 20'î ya bi beşa bi hejmara 189'an li gor KAÎP'a(Planên Avadaniyê yên Parastinê) heyî wek Qada Dezgehên Perwerdehiya Seretayî,
• Li taxa Hasirliyê parsêlên bi hejmara 78, 79, 80, 84, 85, 86, 87, 88'an ên beşa bi hejmara 673'yan li gor KAÎP'a(Planên Avadaniyê yên Parastinê) heyî Qada Dezgehên Perwerdehiya Seretayî ye, lê wek Qada Karên Asayîşê hatiye veguherandin.

Bi KAÎP'ya navborî tevahiya biryarên ku hatine wergirtin bi tenê li gor pîvanên ewlehiyê hatine wergirtin û qada nav Sûrê bi hincetên ewlehiyê hatiye veguherandin û bi vê hişmendiyê jî plansazî veguherandine navgîneke parastinê. Nêzikatiya ku parastinê wek navend dipejirîne, hemû nirxên din paşguh dike û li dijî rêgezên planên zanistî yê bajarvaniyê û berjewendiyên civakê ye.

Li gor tesbîtên ku me kirine, li ser rêyên ku dê bên vekirin û qadên ku wek Qadên Karên Asayîşê hatine veqetandin 17 avahiyên çandî/dîrokî yên destnîşankirî, 42 avahiyên kevneşopî yên hêjayî parastinê û bi giştî jî 976 avahî dê bi biryara veguhartina planê de dê bên hilweşandin (di rewşa heyî de piraniya van avahiyan hatine hilweşandin). Angaştên ku dê di vê planê de avahiyên çandî/dîrokî yên destnîşankirî bên parastin, ligel biryara vekirina rêyên nû û avakirina Qadên Karên Asayîşê jî nehatiye diyarkirin ku dê ev avahî çawa bên parastin.

Lijneya Koordînasyonê ya Bajêr a TMMOB'a Amedê li dijî plana veguherandî nûsafeke ku ji 17 xalan pêk dihat amade kir. Çend xalên ji nûsafê li jêrin;

**Xala 3'yemîn;**
Biryarên ku bi KAIPD'ya navborî hatine wergirtin hemû bi hincetên ku asayîşê wek navend dipejirînin hatine wergirtin û bi van hincetan nav Sûrê tê veguherandin, bi vê nêzikatiyê jî plansaziyê vediguherînin navgîneke parastinê. Nêzikatiya ku parastinê wek navend dipejirîne, hemû nirxên din paşguh dike û li dijî rêgezên bajarvaniyê planên zanistî û berjewendiyên civakê ye.

**Xala 4'emîn;**
Gava ku mirov nûsafa ravekirina veguherînên planê vedikole, bi awayekî zelal tê dîtin ku guhertinên navborî bi armanca asayîşê pêk hatine. Rastiya ku nav Sûrê qadeke mîratê ya ku ji tevahiya cîhanê re bûye mal û her destwerdana ku dê di honaka bajêr de pêk bê, dê wendahiyên bingehîn pêk bîne, bi tevahî hatiye paşguhkirin. Nûsafa planê bi vê taybetiya xwe ji rastiyê dûr e. Di destpêka nûsafê de ji nirxên bajêr tê behskirin lê li dijî şêniyên bajêr ên ku ev nirx afirandine pêşniyarên ku parastinê dikin navend tên kirin. Ji bo lêkirina avahiyên ku dê vê vatiniyê bi cih bînin jî nirxên bajêr ên xweser tên hilweşandin. Di heman demê de li hemberî qadeke ku di navnîşa mîrata cîhanê de cih girtiye, nêzikatiyeke li dijî pîvanên gerdûnî tê nîşandan.

**Xala 7'an;**
Di xala 3.15 ya Hukmên Sepandina Plana KAIPD'yê de ji bo planên avadaniyê yên sepanê wiha tê gotin "... di çarçoveya plansaziyê de li qadên ku ji aliyê Wezareta Bajarvanî û Hawirdorê ve hatine destnîşankirin projeyên Sêwirandina Bajêr ên ku dê bên amadekirin di pêveka vê planê de ne.

Rêbazên sepanê yên ku di vê planê û xalên wê de cih nagirin, di projeyên sêwirandina bajêr û avahîsaziyê de tên diyarkirin." Di xala 3.31.1'an de tê gotin ku "sepana bi armanca parastinê li gor kitekitên plana avahîsaziyê û projeya avadaniyê di planên bi pîvanên 1/500 û 1/200 an jî 1/100'î de û di pêvajoyên avakirinê de tên diyarkirin. Di van projeyan de, ji derveyî parsêla destnîşankirî, bêyî ku bibe mijara veguherîna planê, mezinahî, cih û vatiniya avahiyan tê diyarkirin." Di xala 3.31.2'yan de jî tê gotin ku "di qada planê de pêvajoya sepanên tevahiya qadên sergirtî û servekirî yên ku ji aliyê Wezareta Bajarvanî û Hawirdorê ve hatine diyarkirin li gor çarçoveya Projeya Sêwirandina Bajêr a wek pêveka planê tê pêkanîn. Li gor van hukman projeyên ku di plana heyî de nehatine destnîşankirin jî wek pêveka planê tên pejirandin û bêyî ku pêdivî bi erêkirina sêwirandina bajêr an jî projeyên avahîsaziyê hebe, ji însiyatîfa avahîsaz/plansazan re hatiye hiştin û projeyên ku dê li nav Sûrê bên çêkirin ji derveyî venêrînê hatine hiştin û pêdivî bi erêkirinê nedîtine. Ev rewş bi awayekî zelal li dijî pîvan û rêbazên plansaziyê ye.

**Xala 8'an;**
Wek ku di xala 5.19.1'an a Hukmên Sepana Plana KAIPD'yê tê gotin, "... avahiyên xizmetê, pêvekên wan û dîwarên derdora wan ên ku dê li van qadan bên lêkirin herî zêde 8 metre ye." Ev hevok dê bibe sedema têkçûna perspektîf û raçînka kuçeyên kevneşopî. Berê hinek parsêlên ku dê qereqol li serê bên çêkirin bi qasî 100 metreyan dirêj e û li gor vê rewşê dê ji aliyê sêwirandina bajêr ve pîvana di navbera bilindahiya

avahiyê û firehiya rê de ne di cih de be. Dê rasterast bandorê li pêvajoya sûdwergirtina ji rojê ya kuçeyan û parsêlên cîranan bike. Wekî din jî ev eniyên kerr ên ku ji bo kuçeyên teng tê pêşniyarkirin ji ber ku ne li gor pîvanên mirovî ne, dê bandoreke neyînî li ser derûniya kesên ku wan kuçeyan bi kar tînin de bike.

**Xala 13'an;**
Li gor tesbîtên ku me kirine, li ser rêyên ku dê bên vekirin û qadên ku wek Qadên Xebatên Asayîşê hatine veqetandin 17 avahiyên çandî/dîrokî yên destnîşankirî, 42 avahiyên kevneşopî yên hêjayê parastinê û bi giştî jî 976 avahî dê bi biryara veguhartina planê bên hilweşandin (di rewşa heyî de piraniya van avahiyan hatine hilweşandin). Angaştên ku dê di vê planê de avahiyên çandî/dîrokî yên destnîşankirî bên parastin, ligel biryara vekirina rêyên nû û avakirina Qadên Xebatên Asayîşê jî nehatiye diyarkirin ku dê ev avahî çawa bên parastin.

**Xala 15'an;**
Di KAIPD'ê de der barê Projeyên Sêwirandina Bajêr de, bi pîvekên mezin tu biryareke yekgirtî tune ye. Ev yek jî dike ku yekîtiya planê têk biçe û dibe sedem ku li dijî KAIPD'ê, li hemberî raçînka bajêr a kevneşopî, destwerdan pêk bê.

**Xala 16'an;**
Di nûsafa ravekirina Plana KAIPD'ê de wek hinceta vekirin û guhertina rêyan "hêsankirina ewlehî, xebatên serwîsê, çuyîn û hatina wesayîtên agirkujiyê, ji bo xizmetên tenduristiyê çuyîn û hatina ambûlansan," hatiye nîşandan. Di KAIPD'a navborî de tê dîtin ku rêyên ku dixwazin vekin bi tenê dê ji "Qadên Xizmetên Ewlehiyê" re xizmetê bikin. Ligel ku ji bo wargehên wek nav Sûrê yên ku xwediyê raçînkeke bajarî ya kevnare ne, ji bo agirkujî, ambûlans û pêdiviyên giştî çareseriyên teknolojîk ên nûjen dikarin bên dîtin jî, ev pêdivî wek hincet hatine nîşandan û hilweşandinên ku dê zirarê bidin raçînka bajêr bi biryarên planê tên rewakirin.

## HILWEŞANDINA PIŞTÎ ŞER

Di 9'ê Adar 2016'an de, wezîrê Karên Navxweyî Efkan Ala daxuyand ku operasyonên leşkerî yên li dijî Sûrê bi awayekî fermî bi dawî bûne. Piştî vê mêjûyê pêvajoya hilweşandina nav Sûrê jî lezgîntir bû. Ji ber ku 'Qedexeya Derketina Derve' ya ku li qadê didomiya nehatibû rakirin, hemû daneyên teknîkî yên têkildarî vê pêvajoyê em neçar man ku ji xuyangên peykan û dîmenên 'Google Earth'ê wergirin. Li gor daneyên ku me ji van dîmenên ji jor ve hatibûn kişandin wergirtine;


Xuyanga Peykê ya 10.05. 2016'an
Amed/SÛR





# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

## Xuyanga Peykê ya 10'ê Gulan'a 2016'an



**NÎŞANE**

Qada Hilweşandî / 10'ê Gulan'a 2016'an

| | |
|---|---|
| Qada Giştî ya nav SûrêYasaklı 6 | : 148 Hektar |
| Qada Giştî ya 6 taxên qedexekirî | : 75.3 Hektar |
| Qada ku hatiye hilweşandin | : 10.7 Hektar |

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

## Xuyanga Peykê ya 10'ê Gulan'a 2016'an



**NÎŞANE**

SÎNORÊN TAXAN


SÎNORÊN QADÊN HILWEŞANDÎ

QADA HILWEŞANDÎ

1 QAT
2 QAT
3 QAT
4 QAT
5 QAT
6 QAT
7 QAT
8 QAT

| Navê Taxê | Avahiyên Hilweşandî | Avahiyên Zirardîtî |
|---|---|---|
| Hasirli | 347 | 119 |
| Fatîh paşa | 232 | 67 |
| Cemal Yilmaz | 126 | 13 |
| Savaş | 83 | 45 |
| Dabanoglû | 44 | 23 |
| BI GIŞTÎ | 832 | 267 |


Xuyanga Peykê ya 16'ê Gelawêj'a 2016'an
Amed/SÛR





# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

## Xuyanga Peykê ya 16'ê Gelawêj'a 2016'an



**NÎŞANE**

10'ê Gulan'a 2016'an, Qadên Hilweşandî

16'ê Gelawêj'a 2016'an Qadên Hilweşandî

| | |
|---|---|
| Qada Giştî ya nav Sûrê | : 148 Hektar |
| Qada Giştî ya 6 taxên qedexekirî | : 75.3 Hektar |
| Qada ku hatiye hilweşandin | : 20.3 Hektar |

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

## Xuyanga Peykê ya 16'ê Gelawêj'a 2016'an




**NÎŞANE**

SÎNORÊN TAXAN
SÎNORÊN QADÊN HILWEŞANDÎ
QADA HILWEŞANDÎ

1 QAT
2 QAT
3 QAT
4 QAT
5 QAT
6 QAT
7 QAT
8 QAT

| Navê Taxê | Avahiyên Hilweşandî | Avahiyên Zirardîtî |
|---|---|---|
| Hasirli | 865 | 119 |
| Fatîh paşa | 381 | 57 |
| Cemal Yilmaz | 134 | 13 |
| Savaş | 93 | 45 |
| Dabanoglû | 46 | 23 |
| BI GIŞTÎ | 1519 | 257 |


Xuyanga Peykê ya 11’ê Tirmeh’ê 2017’an
Amed/SÛR





# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

## Xuyanga Peykê ya 11'ê Tirmeh'ê 2017'an



**NÎŞANE**

10'ê Gulan'a 2016'an, Qadên Hilweşandî
16'ê Gelawêj'a 2016'an Qadên Hilweşandî
11'ê Tirmeh'ê 2017'an Qadên Hilweşandî

| | |
|---|---|
| Qada Giştî ya nav Sûrê | : 148 Hektar |
| Qada Giştî ya 6 taxên qedexekirî | : 75.3 Hektar |
| Qada ku hatiye hilweşandin | : 46.3 Hektar |

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

## Xuyanga Peykê ya 11'ê Tirmeh'ê 2017'an




| | YIKILAN YAPI | YIKILMAYAN YAPI | TOPLAM YAPI |
|---|---|---|---|
| 1 KATLI | 1379 | 383 | 1762 |
| 2 KATLI | 1960 | 782 | 2742 |
| 3 KATLI | 146 | 121 | 267 |
| 4 KATLI | 35 | 47 | 82 |
| 5 KATLI | 31 | 48 | 75 |
| 6 KATLI | 14 | 22 | 36 |
| 7 KATLI | 4 | 9 | 13 |
| 8 KATLI | - | 4 | 4 |
| | 3569 | 1416 | 4985 |


**NÎŞANE**


- SÎNORÊN TAXAN
- SÎNORÊN QADÊN HILWEŞANDÎ
- QADA HILWEŞANDÎ

| | |
|---|---|
| 1 QAT | 5 QAT |
| 2 QAT | 6 QAT |
| 3 QAT | 7 QAT |
| 4 QAT | 8 QAT |

**Qada Giştî ya nav Sûrê:** 148 Hektar
**Qada Giştî ya 6 taxên qedexekirî:** 75.3 Hektar
**Qada ku hatiye hilweşandin:** 46.3 Hektar
**Ji van 6 taxan %61'ê qadê û %72'ê avahiyan hatiye hilweşandin.**

Xuyanga Peykê ya 11.07.2017
Amed/SÛR





Amed/Sûr
VATPAŞA MAHALLESİ
MAHALLESİ
FATİHPAŞA MAHALLESİ
HASIRLI MAHALLESİ

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

## Xuyanga Peykê ya 11'ê Tirmeh'ê 2017'an



**NÎŞANE**

| | | |
|---|---|---|
| KELEHA AMEDÊ | KANÎ | AVAHIYÊN BÎRDARIYÊ |
| QADA ARKEOLOJÎK Û MIZGEFT | MUZE (KOMA 1'EMÎN) | AVAHIYÊN TAYBET ÊN AVAHÎSAZIYÊ YÊN SÎVÎL |
| MESCÎD Û ZIYARET | AVAHIYÊN GIŞTÎ (KOMA 1'EMÎN) | AVAHIYÊN TAYBET ÊN JÎNGEHÊ |
| XAN | DÊR Û KENÎŞTE | AVAHIYÊN ZIRARDÎTÎ |
| HEMAM | SÛKÊN ÇANDÎ/DÎROKÎ DESTNÎŞANKIRÎ | AVAHIYÊN NÎVHILWEŞIYAYÎ |
| | | AVAHIYÊN HILWEŞIYAYÎ |

**AVAHIYÊN ÇANDÎ/DÎROKÎ YÊN DESTNÎŞANKIRÎ YÊN KU HATINE HILWEŞANDIN: 40 - AVAHIYÊN ÇANDÎ/DÎROKÎ YÊN DESTNÎŞANKIRÎ YÊN HÊJA YÊN KU HATINE HILWEŞANDIN: 247**

Ji ber ku têketina qadê hîna jî qedexe ye ev dane ji xuyangên peykê yan jî nexşeyan hatine wergirtin.

| AVAHIYÊN DÎROKÎ YÊN KU BI TEVAHÎ YAN JÎ HINEKÎ HILWEŞIYANE | |
|---|---|
| TAX | AVAHÎ |
| Savaş | Mizgefta Hecî Hemîd |
| Hasirli | Dêra Ermenên Katolîk |
| Hasirli | Mala Mehmed Ûzûn |
| Cemal Yilmaz | Dibistana Seretayî ya Cumhûriyetê |
| Fatîh Paşa | Dibistana Seretayî ya Suleyman Nazif |
| Hasirli | Cilşoxaneya Şaredariya Bajarê Mezin |
| Cemal Yilmaz | Mizgefta Hocaoglû |
| Fatîh Paşa | Ziyareta Zincîrqiran |
| Fatîh Paşa û Hasirli | 3 Kanî |

| AVAHIYÊN DÎROKÎ YÊN ZIRARDÎTÎ | |
|---|---|
| MAHALLE | YAPI |
| Hasirli | Mizgefta Erebşêx |
| Cemal Yilmaz | Mizgefta Saloş |
| Savaş | Mala Amedê |
| Camî Kebîr | Mizgefta Mezin |
| Savaş | Otêla Muş'a kevn |
| Dabanoglû | Qonaxa Şêxzadeyan |
| Fatîh Paşa | Hemama Çardaxî |
| Fatîh Paşa | Binkeya Tenduristiyê ya Yenîkapi |
| Hasirli | Hemama Paşa |
| Savaş | Baxçeyê Zarokan a Sodesê |
| Fatîh Paşa | Mizgefta Qûrşûnluyê |
| Savaş | Minara Çarling |
| Savaş | Mizgefta Şêx Mutahar |
| Cemal Yilmaz | Dêra Protestanan |
| Savaş | Dêra Surp Gîragos |
| Savaş | Dêra Keldaniyan a Mar Petyûm |
| Cemal Yilmaz | Mizgefta Husrev Paşa |
| Dabanoglû | Mizgefta Nasûh Paşa |
| Dabanoglû | Dibistana Seretayî ya Yavûz Selîm |
| Fatîh Paşa | Mala Esma Ocak |
| Ziya Gokalp | Mala Dengbêjan |
| Dabanoglû | Mizgefta Qazî |
| Dabanoglû | Mizgefta Brahîm Beg |

# AVAHIYÊN KU PIŞTÎ HILWEŞANDINÊ WEZARETA HAWIRDOR Û BAJARVANIYÊ LÊKIRINE

Di 4'ê Rêbendan'a 2017'an de Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê merasîmeke fermî ya bingehdanînê li dar xist û lêkirina avahiyên nû dest pê kir. Ev avahî pêşiyê li taxa Hasirliyê hatin lêkirin. Li gor Plana Avadaniyê Ya Parastinê, diviyabû ku Lijneya Herêmê ya Parastina Heyînên Çandî proje erê bikira. Lê bêyî ku bê erêkirin û bê venêrîn, proje hat sepandin. Şaxa Amedê ya Odeya Avahîsazan ji lijneyê re nivîsek nivîsand. Bi nivîsa bi mêjû ya14.08.2017'an û bi hejmara 17/314'an der barê projeyên ku hatine erêkirin de agahî xwest. Di 21.08.2017'an de lijneyê bersiv da û diyar kir ku tu proje ji aliyê wan ve nehatine erêkirin. Di wêneyên ku di 11.07.2017'an de ji hewayê ve hatine kişandin de pir zelal dixuyê ku avahiyên nû hatine lêkirin.



T.C.
KÜLTÜR VE TURİZM BAKANLIĞI
DİYARBAKIR KÜLTÜR VARLIKLARINI
KORUMA BÖLGE KURULU MÜDÜRLÜĞÜ

Sayı : 44821064/168-2412
Konu : Diyarbakır İli, Sur İlçesi, Hasırlı Mah. Yeni Yapılan Yapılara İlişkin.

DİYARBAKIR
21.08.2017

TMMOB DİYARBAKIR MİMARLAR ODASI

İLGİ: 14.08.2017 tarih ve 17/314 sayılı yazınız.

Diyarbakır İli Sur İlçesi Hasırlı Mahallesinde Müdürlüğümüzce yaptırılan yer yapılar ile ilgili Kurulumuzca onaylanan kaç proje olduğu hakkında odanıza bilgi verilmesin ilişkin ilgi yazı incelenmiştir.

Diyarbakır İli Sur İlçesi Hasırlı Mahallesinde yaptırılan yeni yapılarla ilgi Müdürlüğümüze iletilen ve Diyarbakır Kültür Varlıklarını Koruma Bölge Kurulu tarafında onaylanan herhangi bir proje bulunmamaktadır.

Bilgilerinize rica ederim.

Mehriban KARAASLAN
Bölge Kurulu Müdürü



**Şaxa Amedê ya Odeya Avahîsaz'an a TMMOB'ê di 29.06.2017'an de der barê avahiyên dijraber de nûsafek amade kir;**

* Li gor KAÎP'ê (Plana Avadaniyê ya Parastinê) diviyabû ku taybetiyên kevneşopî yên berên kuçeyan bihatina parastin û tedbîr bihatina wergirtin. Qadên ku xwediyê kuçeyên taybetiyên çandî bûn, diviyabû bihatina parastin, dîwarên hewşan bi kel û pelên xweser bihatina lêkirin lê tê dîtin ku ev yek li ber çavan nehatiye girtin û dîwarên hewşan bi kevirên reş ên birandî hatine lêkirin.

* Li gor KAÎP'ê, ji ber ku korekuçe yên Sûrê taybetiyeke girîng a raçînka bajêr in, diviyabû bihatina parastin, lê li gor vê taybetiyê tevnagerin.

* Li gor KAÎP'ê, divê hewş, dîwarên hewşan, bermala wan, derence, derî, birk û bîrên di parsêlê de heyî jî bên parastin. Lê nêzikatiyeke bi vî awayî nayê dîtin.

* Li gor KAÎP'ê divê di her parsêlekê de şaneşîn hebe, lê di avahiyên ku nû hatine çêkirin de gelek şaneşîn hene.

* Li gor KAÎP'ê ji bo mehremiyeta kuçeyên teng divê bi tenê li rast û çepê şaneşînan pace hebin. Lê tê dîtin ku di berê şaneşînan de jî pace çêkirine.

* Li gor KAÎP'ê divê pace bi kember bin û li xala herî jor jî kevirê ragirtinê hebe. Lê ji ber ku di avahiyên nû de kevirên birandî hatine bikaranîn, kevirê ragirtinê tune ye.

* Li gor KAÎP'ê diviyabû ku di xaniyên niha tên çêkirin de jêrzemîn tune be. Lê di xaniyên ku nû hatine çêkirin de jêrzemîn jî hene.

* Li gor KAÎP'ê divê sînorên parsêlan bên parastin, lê di xaniyên nû de sînor rast hatine kişandin, ango sînorên parsêlan li hinek cihan nehatine parastin.

* Li gor KAÎP'ê diviyabû ku sînorên hewşan bihatina parastin, lê di hinek avahiyên nû de hewş hatine biçûkkirin.

* Li gor KAÎP'ê divê hêmanên wek dar, birk û bîr ên li hewşê ku hêmanên girîng ên raçînkê ne bihatina parastin, lê ji holê hatine rakirin.

* Di xaniyên Amedê yên kevnare de li ser deriyê têketina hewşê sefik heye. Lê ev di avahiyên nû de nehatiye çêkirin.

* Di xaniyên Amedê yên kevnare de di banan de sifirnek tune ye, lê di avahiyên nû de sifirnek çêkirine.

* Banên xaniyên berê ax in. Li gor KAÎP'ê diviyabû ku bi heman awayî bên çêkirin, lê di avahiyên nû de ban ji betonê hatine çêkirin û li ser betonê kevirê reş hatiye raxistin.



Maleke Nû ya Sûrê



Maleke Nû ya Sûrê


Maleke Nû ya Sûrê

## LI ELÎ PAŞA Û LALE BEYÊ PÊVAJOYA VEGUHERÎNA BAJÊR

Di 4'ê Rezber'a 2007'an de, di navbera TOKÎ û Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê de pêşpeymanek hat morkirin. Navê wê jî 'Projeya Veguherîna Bajêr a "Kembera Parastina Sûra Dîrokî ya Amedê" bû. Di çarçoveya vê peymanê de 452 kesên xwedîmaf hatibûn destnîşankirin. Li gor daxuyaniya ku TOKI'yê dabû sedema projeyê ev bû: Jiholêrakirina şevnişînên li dora Kembera Sûra Dîrokî û sepandina plana avadaniyê ya parastinê. Piştî ku ev pêşpeyman hat morkirin, çarçoveya projeyê hat berfirehkirin û di 21'ê Adar'a 2008'an de, di navbera Parêzgeriya Amedê û TOKI'yê de bi navê 'Projeya Veguherandina Taxên Elî Paşa û Lale Beyê yên Amedê' peymanek hat morkirin. Piştî wê jî, ji bo ku ev her du proje bi awayekî 'sererast' bên meşandin, di 14'ê Kewçêr'a 2009'an de, di navbera Parêzgeriya Amedê, TOKÎ, Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û Şaredariya Sûrê de peymana dawîn hat morkirin. Li gor vê peymanê, li taxên Elî Paşa û Lale Bey'ê 824 kesên xwedîmaf hatin destnîşankirin û bi giştî 1276 kesên xwedîmaf ango xane, diviyabû ku ji Sûrê bihatina derxistin û ew xanî bihatina hilweşandin. Li gor vê peymanê, diviyabû ku karên giştîkirinê û hilweşandinê yên li nav Sûrê ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin ve bihatina kirin. Dê TOKI'yê jî li Gozeliyê, di du gavan de bi giştî 1272 xanî çêbikirina. Ev peymana ku di 2009'an de hatibû morkirin heta 2012'an nehat sepandin. Lewra heta wê demê diviyabû Plana Avadaniyê Ya Parastinê bihata amadekirin. Di sala 2012'an de Plana Avadaniyê ya Parastinê hat erêkirin û piştî wê jî li nav Sûrê xebatên hilweşandinê dest pê kirin. Lê bi taybetî ji ber ku welatiyên li Elî Paşa û Lale Bey'ê teklîfa lihevkirinê ya TOKI'yê nepejirandin û li dijî hilweşandinê derketin, ev proje nîvco ma. Şaredariya Bajarê Mezin jî paşê bi hinceta ku proje ne li gor berjewendiyên gelê Sûrê ye, bi awayekî yekalî da sekinandin.



Li taxa Elî Paşa û Lale Bey'ê destpêka hilweşandinê



Avahiyên ku di çarçoveya veguherandina bajêr de hatine hilweşandin.

Bi biryara Lijneya Wezîran a bi mêjûya 21.03.2016'an û hejmara 2016/8659'an a li gor xala 27'emîn a Zagona Giştîkirinê ya bi hejmara 2942'yan, li nav Sûrê ji 7714 parsêlan, ji bo 6292 parsêlan biryara Giştîkirina Lezgîn hat wergirtin. Piştî vê biryarê jî li taxên Elî Paşa û Lale Bey'ê hilweşandin careke din ket rojevê. Hilweşandinê di 23'ê Gulan'a 2017'an de dest pê kir û bi vî awayî pêvajoya bi darê zorê koçberkirina tevahiya gelheya taxên Elî Paşa û Lale Bey'ê dest pê kir.



Li Taxên Elî Paşa û Lale Bey'ê Pêvajoya Hilweşandinê


Li Taxên Elî Paşa û Lale Bey'ê Koçberkirina Bi Darê Zorê

Wêne: Fatma ÇELİK

# ŞIRNEX

Li navenda Şirnex'ê 11 tax hene. Di 14'ê Adar'a 2016'an de, roja duşemê, di malpera Parêzgeriya Şirnex'ê de hat daxuyandin ku derketina derve hat qedexekirin. Ev qedexe 8 mehan domiya. Di 14'ê Sermawez'a 2016'an de (navbera saetên 22:00 û 05:00'an ne tê de) qedexe bi awayekî sînorkirî hat rakirin. Di 8'ê Reşemi'ya 2017'an de jî ev sînor wek navbera saetên 23:00 û 02:30'an hat diyarkirin. Ligel ku di 3'yê Pûşper'a 2016'an de hat ragihandin ku operasyonên leşkerî bi dawî bûne jî, lê qedexe heta 10'ê Avrêl'a 2017'an, bi awayekî sînorkirî be jî domiya. Hatiye destnîşankirin ku qedexe bi giştî 391 rojan domiyaye.

Di vê pêvajoyê de 64 hezar kes bi darê zorê hatine koçberkirin û hejmara kesên ku jiyana xwe ji dest dane bi awayekî zelal nehatiye destnîşankirin.



Şirnex




Şirnex

Piştî ku operasyon bi dawî bûn, li bajêr di bin navê lêgerîn û lêkolînê de xebateke hilweşandinê ya zêde dest pê kir û di encama van hilweşandinan de, zirar û ziyanên ku nikarin ji holê bên rakirin pêk hatin. 7 taxên bajêr (Aydinlikevler, Îsmet Paşa, Cumhuriyet, Gazî Paşa, Bahçelîevler, Vakifkent, Yeşîlyûrt) kêm zêde bi tevahî ji holê hatine rakirin. Hilweşandin di pêvajoya qedexeyê de û piştî wê jî bê navber domiyaye. Destûr nehatiye dayîn ku mirov amurên xwe ji xaniyan derbixin.



Şirnex



Şirnex

Dîsa pêdiviyên bingehîn ên mirovan nehatine dabînkirin, av û kareba hatine qutkirin û ji ber vê yekê jî gel neçar maye ku bajêr biterikîne. 200 malbatên ku nexwestine ji bajêr derkevin û derfeta wan tune bû li nêzî bajêr bi qasî 6 mehan di konan de man, û paşê hêzên asayîşê bi darê zorê ew ji van konan derxistin.


Şirnex

Di vê pêvajoya ku ev tişt hatine jiyîn de bi tu awayî derfet çênebûye ku mirov xwe bigihînin bajêr û rewşê li cih tesbît bikin. Bêyî ku li qadê tu tesbîtek bê kirin, li ser daxwaza Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê, Lijneya Wezîran di mêjuya 01.08.2016'an de, der barê 5 taxên (Cumhuriyet, Gazî Paşa, Îsmet Paşa, Yenî û Yeşîlyûrt) bajêr de biryara 'Qada Xeternak' wergirtiye. Ev biryar bêbingeh û li dijî hiqûqê ye. Lewra ev biryar piştî ku li taxan hilweşandinê dest pê kiriye hatiye wergirtin. Bi vî awayî xwestine ku bingehê ji hilweşandinan re çêbikin. Li aliyê din, li derveyî qadên ku wek qada xeternak hatine diyarkirin jî hilweşandin domiyaye. Wek bajarên din, hilweşandin li qadên ku tu zirar û ziyan çênebûne û pevçûn lê neqewimîne jî hatine domandin.


Xaniyên nû yên TOKI'yê

**Karar Sayısı : 2016/9082**

Şırnak İli, Merkez İlçesi, Cumhuriyet, Gazipaşa, İsmetpaşa, Yeni ve Yeşilyurt mahalleleri içerisinde bulunan ve ekli kroki ile listede sınır ve koordinatları gösterilen alanın riskli alan ilan edilmesi; Çevre ve Şehircilik Bakanlığının 26/7/2016 tarihli ve 9184 sayılı yazısı üzerine, 6306 sayılı Afet Riski Altındaki Alanların Dönüştürülmesi Hakkında Kanunun 2 nci ve ek 1 inci maddelerine göre, Bakanlar Kurulu'nca 1/8/2016 tarihinde kararlaştırılmıştır.

Recep Tayyip ERDOĞAN
CUMHURBAŞKANI

**1/8/2016 TARİHLİ VE 2016/9082 SAYILI KARARNAMENİN EKİ**

**KROKİ VE KOORDİNAT LİSTESİ**



ŞIRNAK İLİ MERKEZ İLÇESİ
CUMHURİYET, GAZİPAŞA, İSMETPAŞA, YENİ VE YEŞİLYURT MAHALLELERİ
RİSKLİ ALAN SINIR KROKİSİ

ŞIRNAK İLİ MERKEZ İLÇESİ
CUMHURİYET, GAZİPAŞA, İSMETPAŞA, YENİ VE YEŞİLYURT MAHALLELERİ
RİSKLİ ALAN KOORDİNAT LİSTESİ

PROJEKSİYON : UTM (3 DERECE)
DATUM : ITRF96
D.O.M. : 42

SAYFA : 1/2

ŞIRNAK İLİ MERKEZ İLÇESİ
CUMHURİYET, GAZİPAŞA, İSMETPAŞA, YENİ VE YEŞİLYURT MAHALLELERİ
RİSKLİ ALAN KOORDİNAT LİSTESİ

PROJEKSİYON : UTM (3 DERECE)
DATUM : ITRF96
D.O.M. : 42

SAYFA : 2/2

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN


Xuyanga Peykê ya 06.11.2013'an




**NÎŞANE** QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

## Xuyanga Peykê ya 29.08.2016'an




| REWŞA GIŞTÎ | | | |
|---|---|---|---|
| | YÊN HILWEŞIYAYÎ | YÊN HILNEWEŞIYAYÎ | BI GIŞTÎ |
| 1 Qat | 797 | 941 | 1738 |
| 2 Qat | 845 | 643 | 1488 |
| 3 Qat | 192 | 143 | 335 |
| 4 Qat | 64 | 77 | 141 |
| 5 Qat | 30 | 52 | 82 |
| 6 Qat | 24 | 56 | 80 |
| 7 Qat | 10 | 11 | 21 |
| 8 Qat | 0 | 2 | 2 |
| YÊN DIN | 0 | 3 | 3 |
| | 122 | 227 | 349 |
| | 2084 | 2155 | 4239 |

**QADA HILWEŞANDÎ = 89,86 HA**


**NÎŞANE** QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN


## Xuyanga Peykê ya 12.08.2018'an




**NÎŞANE** QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN




Xuyanga Peykê ya 12.08.2018'an
Şirnex/NAVEND


Dicle

# GEVER

Navçeya Geverê ji 17 tax û 58 gundan pêk hatiye. Li navçeyê cara yekem qedexe di 26'ê Gelawêj'a 2015'an de hatiye ragihandin. Paşê jî bi navberan di 19'ê Rezber'a 2015'an de, 20'ê Sermawez'a 2015'an de, 7'ê Berfanbar'a 2015'an de qedexe hatiye ragihandin. Di dema van dorpêçan de 5 welatiyên sîvîl (Ersîn AYDIN-37, Naîm NUYAN-29, M. Reşît ARICÎ-17, Fettah ES-37 û Yakup BABAT-24) jiyana xwe ji dest dane. Cara paşîn di 13'ê Adar'a 2016'an de bi awayê ku ji saet 22:00'yan şûnde derbasdar be qedexe hat ragihandin û ev qedexe piştî 79 rojan, di 30'ê Gulan'a 2016'an de, ji bo saetên navbera 06:00 û 20:00'an de bi awayekî sînorkirî hat rakirin. Di van 79 rojên ku qedexeyê dom kir de ne pêkan bû ku mirov xwe bigihîne navçeyê, agahiyên sererast jê wergire û tesbîtên zelal ên der barê rewşê de bike. Dîsa li derveyî navenda navçeyê, li gundê Wezîrava'yê û gundikê Çîmenliyê di 30'ê Adar'a 2016'an de qedexe hat ragihandin û ev qedexe heta 30'ê Gulan'a 2016'an bênavber domiya. Di van 79 rojên ku dorpêç li navçeyê domiya, di pevçûnan de çekên giran hatin bikaranîn û wek bajarên din, hêzên ewlehiyê wek rêbazekê berê xwe dan hilweşandinê, piştî 79 rojan navçe bû wek xerabeyeke mezin.


Gever


Gever

Di vê pêvajoya dorpêçê de, di pevçûnên ku qewimîne de 39, cenazeyên ku hêzên asayîşê ji Saziya Tiba Edlî ya Erziromê wergirtine 51, cenazeyekî ku di 3'yê Pûşper'ê de hatiye dîtin û 5 kesên ku di dorpêçên berê de jiyana xwe ji dest dane piştî dorpêça Gelawêj'a 2015'an bi giştî li navçeyê 96 welatiyan jiyana xwe ji dest daye.

Dîsa piştî dorpêçê, Şaxa Wanê ya Odeya Endezyarên Avahiyan li navçeyê dest bi xebatên vekolandina zirar û ziyanan kiriye. Li gor nûsafa ku amade kiriye, li Geverê 3193 avahiyên kêm zirardîtî, 647 avahiyên nîv zirardîtî, 787 avahiyên zêde zirardîtî, 867 avahiyên hilweşandî û 1336 xanî û avahiyên şewitandî hene. Li gor daneyên TUIK'ê, li Gever'ê 70.497 kes dijîn. Gava ku mirov di rewşeke wusa de rêjeya avahiyên ku nikarin werin bikaranîn li ber çavan bigire, ji %35'ê gel bêsitar e. Dîsa di nûsafê de tê gotin;

"Piraniya avahiyên nîvzirardîtî ji avahiyên şewitandî pêk tên. Piştî ku dahûrandina maliyetê bê kirin, dê piraniya van avahiyên nîvzirardîtî jî wek zirardîtî bên destnîşankirin. Gava ku mirov vana jî lê zêde bike, hejmara avahiyên ku di rewşa nebikaranînê de ne digihîje 3637'an. Dîsa li gor daneyên TUIK'ê, di her malbatê de 6 kes û nîv dijîn. Li gor van daneyan, mirov dikare bibêje 23.640 kes bêsitar mane. Kêm zêde ji %35'ê gelheyê bêsitar e."

Di nûsafê de tê gotin ku hilweşandina ku li Geverê pêk hatiye ji erdheja Wanê ya 2011'an jî girantir e.


Gever


Gever

Nivîsarên Nijadperest û Zayendî




Gever




Gever


Li navçeya Colemêrgê ya Gever'ê jî, dîsa ji aliyê Wezareta Hawîrdor û Bajarvaniyê ve taxên Cumhûriyet, Dizê, Eskî Qişla, Gungor, Mezarlik, Yenî û Yeşîldere di çarçoveya Zagona Derbarê Veguherandina Qadên Xeternak û Karesatê ve wek 'Qada Xeternak' hatine destnîşankirin û ev biryar di 01.08.2016'an de di rojnameya fermî de hatiye weşandin.


Karar Sayısı : 2016/9088






HAKKARİ İLİ, YÜKSEKOVA İLÇESİ, CUMHURİYET, DİZE, ESKİKIŞLA, GÜNGÖR, MEZARLIK, YENİ VE YEŞİLDERE MAHALLELERİNE AİT RİSKLİ ALAN SINIRI KOORDİNAT LİSTESİ

Projeksiyon UTM3
Datum ED 50
Dilim Orta Meridyeni 45
Alan Büyüklüğü 1291.56 hektar


HAKKARİ İLİ, YÜKSEKOVA İLÇESİ, CUMHURİYET, DİZE, ESKİKIŞLA, GÜNGÖR, MEZARLIK, YENİ VE YEŞİLDERE MAHALLELERİNE AİT RİSKLİ ALAN SINIRI KOORDİNAT LİSTESİ


Projeksiyon UTM3
Datum ED 50
Dilim Orta Meridyeni 45
Alan Büyüklüğü 1291.56 hektar


HAKKARİ İLİ, YÜKSEKOVA İLÇESİ, CUMHURİYET, DİZE, ESKİKIŞLA, GÜNGÖR, MEZARLIK, YENİ VE YEŞİLDERE MAHALLELERİNE AİT RİSKLİ ALAN SINIRI KOORDİNAT LİSTESİ

Projeksiyon UTM3
Datum ED 50
Dilim Orta Meridyeni 45
Alan Büyüklüğü 1291.56 hektar

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN


Xuyanga Peykê ya 29.06.2015'an




**NÎŞANE**
Qadên Avahiyên Hilweşiyayî
Qadên Avahiyên Zirardîtî

# QADÊN KU HATINE HILWEŞANDIN

Xuyanga Peykê ya 19.05.2016'an





| GEVER | YÊN HILWEŞIYAYÎ | YÊN HILNEWEŞIYAYÎ | BI GIŞTÎ |
|---|---|---|---|
| 1 Qat | 253 | 383 | 636 |
| 2 Qat | 58 | 44 | 102 |
| 3 Qat | 24 | 5 | 29 |
| 4 Qat | 9 | 5 | 14 |
| 5 Qat | 3 | 3 | 6 |
| 6 Qat | 4 | 1 | 5 |
| QAT TUNE | 108 | 47 | 155 |
|  | 0 | 0 | 0 |
|  | 459 | 488 | 947 |

**NÎŞANE**

Qadên Avahiyên Hilweşiyayî (red line)
Qadên Avahiyên Zirardîtî (blue line)

## Xuyanga Peykê ya 07.08.2018'an
## Colemêrg/ GEVER




ekova
Güçlü

# KOÇBERÎ

Li tevahiya bajarên ku hilweşandin pêk hatiye koçberî jî pêk hatiye. Ev rastiyeke civakî ye. Di vê pêvajoyê de li wargehên ku şer lê qewimiye, nêzî 400.000 kesan bi darê zorê ji warên xwe hatine koçberkirin.

Li bajarên ku pevçûn pêk hatine, ligel hilweşandina avahiyan pirsgirêkên derûnî, civakî û aborî jî hatine jiyîn. Bi taybetî jî jin, zarok, kal û pîr mexdûrên herî mezin ên vê pêvajoyê ne. Di encama çavdêriyan de hat dîtin ku ev rewş di derûniya jin û zarokan de buye sedema travmayên girîng.

Koça ji van herêman bi piranî ber bi bajarên wek Amed, Wan, Êlih û bajar û navçeyên cîranên van herêman ve pêk hatiye. Di dema koçberkirinê de welatiyan ji derveyî serpêhatî û bîranînên xwe, nikaribûne ti alav û amûreke xwe ya bingehîn jî xelas bikin. Vê rewşê di gelda ligel travmayê, xizanî û bê warbûniyê jî bixwera haniye. Piraniya kesên ku koç kirine li malên ku bi awayekî komî kirê kirine, di şert û mercên pir zehmet de di avahiyên ku binesaziya wan tunebûye de ji neçarî stirî ne. Dîsa, li herêmên koçberiyê zarok demeke dirêj ji perwerdehiyê bêpar mane. Bi her awayî hatiye dîtin ku şer û pevçûn bandorê li tevahiya jiyanê dike û dîsa pêvajoyeke hilweşîn û hilweşandinê ye.

# Nexşeya Koçê ya li jêrê ji aliyê GABB'ê (Yekîtiya Şaredariyên Başûrê Rojhilatê Anatolyayê) ve hatiye amadekirin û belavkirin.

